zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



Hejmar: 41

www.arsivakurdi.org

HÊJE MÊJE

EMÊ NUHA ÇEND

ÇÎROK Û MESELÊN XWE

JI WE RE BÊJIN

Kulîlk

Sal: 1990

www.arsivakurdi.org

DERGÛŞ

Rojek ji rojan, lawikek ji Sîno re çê dibe. Pîreka wî jê re dibê:

-Sîno, dibê tu here cem xerêt, dergûşekê ji lawikê me re bide çêkirin.

Sîno berê xwe dide dikana xerêt. Ji xwe hew xeratek tenê li wê derê hebû, destê wî hinekî giran bû û bîhna wî jî gelekî teng bû. Sîno dighêje cem wî, silevê lê dike, daxwaziya xwe jê re dibê, perê xwe pêşîn dide û hinekî jî lava jê dike, ku dergûşê zû çêbike.

Lê mixabin tev ku ji çend rojan derbekê diçû cem xerêt û lê dipirsî jî, her gav dest vala bi ser malê vedigeriya. Xerat carna bîhna xwe teng dikir û digot:

-Heyran, dibê tu wiha li min ecele neke. Tu dizane gelek kar li ser min heye û ez jî dixwazim rojekê berî rojekê biqedînim.

Ew lawikê ku ewê dergûş jê re çê biba mezin dibê, tê kemala zewacê, di zewice û pişti salekê zarokek ji wan re çê dibe. Dîsa der-



www.darsnakurdi.org

gûşek pêwîst e. Sîno ji bo torinekî wî çêbûye, gelekî bi kêf e. Ew ji lawê xwe re dibê:

-Kurê min, gava tu hatibû dinyê, min ji bo te dergûşek danîbû ser xerêt û perekê wî jî dabû. Silavên min jî lê bike û maşalêh xerêt ew çê kiribe.

Layê Sîno bi lez dihere cem xerat û dibê:

-Apo, gava ez hatibûm dinyê, bavê min ji bo min dergûşek danî bû ser te. Nuha xulamête be, lawekî min çêbû, ez hêvîdarim ku te dergûş çêkiriye.

Xerat bê kû serê xwe rakê û li wî binere, lê vegerand:

-Xortê delal, weleh hîn min ew dergûş çênekiriye.

-Apê delal, ez heyrana çavê te me, tê destê xwe hinekî sivik bigre û wê dergûşê zû çêke. Tu dizane zarok bê dergûş nabe...

Gava xort ew tişt got, bîhna xerat teng bû û bi hêrs ji xort re got:

-Heyran, eger tê jî wek bavê xwe li min ecele bike, fermo perê bavê te û ez tu dergûşa çê nakim.

Pîro

A L Î





www.arsivakurdi.org

Mizgîn

û

Lezgîn

Mamoste




5
BILA EW DEST BI XWARINÊ BIKE, EMÊ WÎ BIXAPÎNIN. 6
7
TU HINEKÎ JI NANÊ XWÊ NADIN JÎ.
NA...!
HEMÛ BI FIRÊKETIN, AZAD BÛN!
8

JIMARÊN RÊZÊ

1.	Yeka	Yekem	Yekemîn
2.	Didoyan	duyem	duyemîn
3.	Sisêyan	sêyem	sêyemîn
4.	Çaran	çarem	çaremîn
5.	Pêncan	pêncem	pêncemîn
6.	Şeşan	şeşem	şeşemîn
7.	Heftan	heftem	heftemîn
8.	Heştan	heştem	heştemîn
9.	Nehan	nehem	nehemîn
10.	Dehan	dehem	dehemîn
11.	Yazdehan	yazdehem	yazdehemîn
20.	Bîstan	bîstem	bîstemîn
30.	Siyan	siyem	siyemîn
40.	Çilan	çilem	çilemîn
50.	Pênciyan	pênciyem	pênciyemîn
60.	Şêstan	şêstem	şêstemîn
70.	Heftêyan	heftêyem	heftêyemîn
80.	Heştêyan	heştêyem	heştêyemîn
90.	Nodan	nodem	nodemîn
100.	Sedan	Sedem	Sedemîn

www.arsivakurdi.org

RASTNIVÎSÎNA JIMARAN

0	Sifir (Nîn)	16	Şazdeh
1	Yek	17	Hevdeh
2	Du, dido	18	Hejdeh
3	Sê, sisê	19	Nozdeh
4	Çar	20	Bîst
5	Pênc	21	Bîst û yek
6	Şeş	30	Sî
7	Heft	31	Sî û yek
8	Heşt	40	Çil
9	Neh	50	Pêncî
10	Deh	60	Şêst
11	Yazdeh	70	Heftê
12	Dozdeh	80	Heştê
13	Sêzdeh	90	Nod
14	Çardeh	100	Sed
15	Panzdeh	101	Sed û yek

200 : Du sed ; **1000** : Hezar ;
1 000 000 : Milyon ; **1 000 000 000** Milyar ;
1000 milyar : Trilyon

KURMANCÎ

www.asivakurdi.org

QUNCIKA
TARÎXA EDEBYETA KURDÎ

SIYAPûŞ

Siyapûş şayrekî di nav xelkê de xweş te naskirin. Lê heta niha qet kesekî nav û nîşanê wî nenivîsî ye. Li kîja herêmê Kurdistanê û kengî ji dayika xwe bûye ne aşîkare.

Nav û dengê wî di nav kurdan de baş belav bû ye, şiêrên wî bi zar di nav xelkê de tê gotin. Lê heyf û mixabin, heta niha destnivîsara şêrên wî, yan jî dîwana wî nehatiye bidestxistin.

Ew şêra wî ya jêr, di pirtûka Dr. Kamuran Bedirxan ya binavê "Fêrbûna zimanê Kurdî" paris, sala 1968 rûyê 47 çap bû ye.

www.kurdkurdi.org

DİLBEREK MIN Dİ

Dîlberek min dî bi çavan
Agirek berda hinavan,
Şemh û rihnîya zilamê,
Zilf û xalên di temamî,
Şerbeta şîrin kelamê,
Sed şikir îro selamê,
Şerh û teqrirê îslamê,
Reng û elwanê di Camî,
Şihbetî çavê di rengê,
Mirarê tîra xedengê,
Kes ne dî qet wî çi rengî,
Qet ne ma qet wî çi rengî,
Sifdera mêrê di cengê,
Sed hezaran wek bi şengê,
Min qebûle hikmê rindan,
Lê çi bêjim qewl û bendan
Zehmetek wan pir bi min dan.
Sed elîf pabûsî bû,
Şemh û der fanusî bû.
Agirek berda di amê,
Qeyd kirin mehbûs bi damê,
Terkî min ne dît midamê,
Kir li min teze xulamê,
Fikir û teswîrê kelamê,
Şihbetî tawûsî bû.
Qews û ebrûyê di bengê,
Zilf û xal û xinçe rengê,
Nexşê maçîn û firengê,
Hikmeta Têmûr û lengî,
Şêr û mexmur û pilingê,
Hikmekî kawusî bû.
Serxweş û sûret lewendan,
Ketme tora lehl û xendan,
Kefşe bim wek gaz û sindan.

(Ji Tarîxa Edebyeta Kurdî 1, Prof. Qenatê Kurdo)

www.kurdi.org

NAVÊ WAN BINIVÎSÎNIN!











www.arsivakurdi.org



CIWANÊN KURDA !

Zanayê bi rûmet, sermîmarê pira evînî û dostaniyê di navbêra gelên kurd û tirk,mamostayê mêrxas İSMİL BEŞİKÇİ ji bo dîsa pirtûkek li ser kurda nivîsand ji alî hukûmeta tirka hat girtin. Dibê em tucar wî jibîr nekin.

www.arsivakurdi.org

QUNCIKA
BAJARÊN KURDISTANÊ

AMED (DIYARBEKIR) - 2 -

ÇANDINÎ:

Ji sisya dudê (2/3) axa Diyarbekir tê ajotin. Bi piranî genim, ceh, nîsk, nok tê çandin. Rez û bexçên vê derdorê jî cihekî baş digre. Genim û ceh bi piranî li Bismil û Çinarê tê çandin. Bismil wek deba genim tê qebûlkirin.

Tûtin û pembo jî li Bismilê, Farqînê û Licê tên çandin.

Fêkî bi piranî ji bajarên din tên, lê zebeş û qawinê Diyarbekir pir bi nav û deng in. Giraniya zebeşan heta 70 - 80 kîloyî jî dikşîne. Di hemû ansîklopediyên dinê de, li pêşiya gotina zebeş, behsa zebeşen Diyarbekirê tê kirin.

Qavin jî 20 - 25 kîlo dikşînin. Gelek bi bêhn û şêrîn in. Li vê herêmê rez jî cihekî girîng digre.

www.arsivakurdi.org



Li vê navçeyê gelek heywan tên xwedîkirin. Bi piranî pez, yanî mîh û bizin tên xwedîkirin. Di van salên talî de xwedîkirna mirîşka jî cihekî girîng digre. Di warê daristanan de, ew derdora ne dewlemend e. Tiştê heye çilo ye û ji bo ardû tê bikaranîn...

ENDÛSTRÎ:

Diyarbekir, di heyamê berê de, navendiyek endustrî û tîcarî bû. Bi avabûna komara Tirkî ve di Diyarbekir de pajdeçûn destpêkir. Ev rewş ji aliyê dewletê bi zanabûn hat bikaranîn. Lê ev tişta ne hew li Diyarbekirê, li hemû aliyê Kurdîstanê tê dîtin. Lê Diyarbekir di dilê dujmin de cîhekî din digre. Di sala 1925 de di serhildana şêx Said de, Diyarbekir cîhekî gelek girîng digirt. Piştî têkçûna serhildanê lehengên (qahremanên) kurda di dadgehên îstiqlalê de hatin ceza kirin. Ev dadgeh li Diyarbekir û Xarpêtê li darxistin. şêx Saîd û hevalên wî li ber deriyê Weli camîyê hatin darvekirin.

Di sala 1975-an de serekê faşîstên tirka Alpaslan Turkeş, wekî alîkarê serekwezîr xweste bê Diyarbekirê. Lê Diyarbekir bi tevayî rabû ser piya û ne hiştin, ku Turkeş bikeve nav bajêr. Wê rojê bi guleyên polîsa xortekî kurd şehîd ket.

Di demên îdareyên urfî de, Diyarbekir dibe navendiya girtiyên kurda. Bi hezaran kurd derdikevin dadgehên leşkerî, bi salan jiyana xwe di zîndanên Diyarbekirê de didomînin û hinek ji wan li wêderê şehît dikevin.

Ji sala 1980-î û vir de, Diyarbekir bi girtîge-



Riyên ziftkirî

Riyên şujikkirî

Riyên zifkirî, teng

Xetên Tirênê

Sînorên nav wilayetan

Meydana belafiran

www.arsivakurdi.org

ha xwe û bi berxwedanên girtiyan, her di rojeva Kurdîstanê û Tirkîyê de ye. Di girtîgehê de, nezîkî 100 kesî bi îşkencê hatinin şehîd kirin.

Dewleta Tirka jî li gor xwe bajarê Diyarbekir ceza dike û naxwaze tu karxane (fabrîqe) lê çêbike. Karxaneyên herî girîng ya Eraqê û ya hirî şuştinê ye. Di van salên talî de karxana turbînên avê ji bo berajan hate avakirin.

Hebûna bin erdê gelek dewlemend e. Petrol û madenên linyîtên cîhekî girîng digrin.

Dan û sitendinê tîcarî li gorî endustriyê, bêtir bi pêjde ye.

(dumahîk heye)

www.arsivakurdi.org

NAVÊN VAN TIŞTANAN LI BINÊ WAN BINIVÎSIN



. . . . . .



. . . . . .



. . . . . .



. . . . . .



. . . . . .



. . . . . .

www.arsivakurdi.org

QUNCIKA MATEMATÎKÊ

1) Azad, Mîrze û Lezgîn hevalên hevin, lê bejna wan ne wek hevin. Hespikên (pisiklêt) wan ji wan re biçûk bunin û ew dixwazin wan bi yên mezitir biguherin. Azad dixwaze hespikê layê xaltîka xwe Rizgo bikire. Rizgo berê ji wî re gotibû, ku ew ji bo hespikê xwe 340 kronan dixwaze. Azad hespikê xwe yê kevn bi 200 kronî difroşe. Gelo çend kron ji Azad re pêwîst e, ku bikanibe hespikê Rizgo bikire ?

www.arsivakurdi.org

2) Mîrze hespikê Azad dikire û yê xwe jî bi 80 kronî difroşe. Ma mîrze çend kronan xistiye ser perê xwe, ku dikanîbû hespikê Azad bikire?

3) Lezgîn nerîna xwe diguhere û dixwaze salek din jî hespikê xwe bi kar bîne. Lê, dibê ku ew cotek lastîkên nuh û kilîtekê ji hespikê xwe re bikire. lastîkek bi 45 krona ye û bihayê kilîtê jî bi 65 krona ye. Gelo çend kron ji Lezgîn re lazime, ku kêmaniyên hespikê xwe pê temam bike?

www.arsivakurdi.org

HÊŞÎNAHÎ - SEWZÎ

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
pîvaz	soğan	oignon	onion
sîr	sarmısak	ail	garlic
pîvazterk	yeşil soğan	oignon frais	shullot
xiyar, arû	salatalık	concombre	cucumber
bejik	kıtır	variété de conbombre	variety of cucumber
acûr	acur	concombre russe	russian cucumber
îsot	biber	poivron	green pepper
kelem	lahana	chou	cabbage
gulkelem	karnıbahar	chou-fleur	cauliflower
kelemê Brukselê	Brüksel lahanası	chou de Bruxelles	Brussels sprout
sorkelem	kızıl lahana	chou rouge	red cabbage
kartol, patat, qompîr	patates	pommes de terre	potato
sêvaxîn	yerelması		
xes	marul	laitue	lettuce
gizêr	havuç	carotte	carrot
pirasa	pırasa	poireau	leek
şiwît	dereotu	fenouil	fennel
bexdenûs	maydanoz	persil	parsley
firingî, şamik, bacanê sor, tomate	domates	tomate	tomato
balican, bacan	patlıcan	aubergine	aborgine,eggplant
fasûlye, lowî	fasulya	haricot	bean
nok	nohut	pois-chiche	chickpea
nîsk	mercimek	lentille	lentil
maş	börülce		
baqil	bakla	fève	broad bean
tevrik, tivir	turp	radis	radish
binerdik	şalgamın bir türü	variété de navet	variety of turnip
şêlim	şalgam	navet	turnip
silk	pancar	betterave	beet
silka sor	kırmızı pancar	betterave rouge	beetroot
silkên şekir	şeker pancarı	betterave sucrière	sugar beet
kundir, kukind	kabak	courge	marrow, pumpkin
dolmik, rextik	kabak	courgette	courgette

www.arsivakurdi.org

QUNCIKA MUZIKÊ
Notenivîs: Cemîla Celîl

AX LÊ MEYRO 15.



Lê, lê, Mey-ro, lê Mey-re-mê, Lê Mey-ro, lê Mey-re-mê.

Ax lê Meyro, lê Meyremê,
Lê Meyro, lê Meyremê,
Lê, lê, Meyro, lê Meyremê,
Lê Meyro, lê Meyremê.

Ax lê Meyro, lê Meyremê,
Dê fileyê, bav e'cemê,
Lê, lê, Meyro, lê Meyremê,
H'evt sala mame cemê.

Ax lê Meyro, lê Meyremê,
Dilkê min ne girto xemê,

Lê, lê, Meyro, lê Meyremê,
Lê Meyro, lê Meyremê.

Ax lê Meyro, lê Meyremê,
Lê Meyro, k'anî-k'anî,
Lê, lê, Meyro, lê Meyremê,
Qewl—qirarê min te danî?

Ax lê Meyro, lê Meyremê.
Dibe tu ji qewla p'oşmanî,
Lê, lê, Meyro, lê Meyremê,
Dibe tu ji qewla p'oşmanî.

www.arsivakurd.org

CENGA DU DÎKAN

Dîkê gewr û bê nîşan
pir merxas û qehreman
Ew dîkê şeng û bedew
li ser pîna xwe bû ew
Pîne milk û malê wî
Cîhê bav û kalê wî
Bi mirdiyaq û pûş û ax
Deh rêz kelpîç û yek max
Li cem dîkê dilawer
Hêja bû textê Qeyser
Dibê hebû li taxê
Dîkekî mala axê
Yekî reşî çel kumik
Bê tore û wek cirik
Geraze û bi nav û deng
Êrîş bire dîkê şeng
Dîkê gewre gerden rût
Niklê xwe wî li hev sût
Ko ew dîkê bi hing û ding
Çav di serî bû piling
Bi mêranî wek ejder
Ji jor xwe avête ser
Wek mêran bê tirs û rev
Bi nukulan hatin hev
Dizîvirîn li çar dor
Kumik li hev kirin sor

www.desiyakurdi.org

Ketin ber pêx û hembêz
Perî ji wan bûne rêz
Dîkê gewrî hiner baz
Paşê dibû serfîraz
Zora dîkê axê bir
Laşê wî tev nikil kir
Pêve nehişt pûrt û per
Ji ber pîna xwe kir der
Polî poşman vegerî
Lê mixabin bê terî
Çav sorî kotek û zor
Nema jê re dem û dor
Pir dijware çerxa dem
Xwe mede ber ey tu hemdem
Binê çi hat serê dîk
Ne terî ma ne perîk
Ko ew dîkê çil kumik
Bû tayê dîkê şinik
Goh bidê xêzên Tîrêj
Di ser guhên xwer mavêj.

www.arsivakurdi.org

QUNCIKA PEYVÊN PÊŞÎYA

1- Aqli sivik, barê giran.
2- Arê kewarê, risqê biharê.
3- Ava bîra, bi tevdîra.
4- Barê darê, darê dixemlîne.
5- Bi dilopê baranê bîr tije nabe.
6- Bixwe mîna mêra, rabe mîna şêra.
7- Bona xatirê xwedî, meriv kevir navêje seyî.
8- Çîyayê bilind timî ser dûmane.
9- Çavê li derî ya, xwelî li serî ya.
10-Derwîn, carekê dixwe firavîn.
11-Dinîya bi dor e, ne bi zor e.
12-Dengê defê ji dûrve xweş tê.
13-Devê rovî negîhaşt tirî, go bira xêra dê û bavê mi be.
14-Hat ji newalê, bû xwedîyê malê.

www.arsivakurdi.org

MIJÛLÎ



www.alfaqaldurdi.org

XAÇEPIRS













www.arsivakurdi.org


AEKTIYÎY
OÊVNTSISTAEY
IRKYETI
JIÎB
UDNATSIRK
NÎAR
ÛERSIY
QRÎA
Hejmarên piçûk bi yên
mezin ve yeko-yeko bighîne
hev.Ji ya herî piçûk dest
pêbike.Rastiya gotinan jî binivîse!

XAÇEPIRS (40)





	1					
	2 K	U	V	A	R	K
3 B	E	L	A	F	I	R
	4 L	E	G	L	E	G
	5 B	Ê	R	I	K	
	E					
	T					
6 H	Ê	L	K	A	N	
	N					









www.arsivakurdi.org

KEREKÎ ME HEBÛ

Û KUNDIREKÎ ME

KERÊ ME

KUNDIRÊ ME KOT KOT

ME JÎ ÇÎROK

Û MESELÊN XWE

YÊN VÊ HEJMARÊ

JI WE RE GOT

Kulîlk

www.arsivakurdi.org



www.arsivekurdi.org

www.arsivakurdi.org



YAN

KURDISTAN

YAN NEMAN !

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

PRIS
BIHA : 15:- skr

www.arsivakurdi.org